

**Dumahîk : Hevpeyvîn**

li darxin, da ku karibin dûv re kongreke netewî serkeftî bînin cî. Ango, gav û komîteyên haziriyê û şêwrê li pêşî bin, da ku piroje berevajî nebe.

- *Balkêş e, ew statukoya ku Rojavayê li ser parçekirina Kurdistanê ava kiribû, îro ji aliyê xeta Rûsya û Çînê ve tê parastin. Hûn veguhertina helwestan çawa dinirxînin?*

- Helwestên dewletan tene guhertin, li gorî berjewendiyên xwe yên aborî û stratejîk, bi şev û roj dixebitin û li ber xwe didin. Jiyan û mafên mirovan û gelan di dawiya listekarê dewletan de jî cî bigire baş e. Têkilî, peyman û pêwendiyên di navbera Rojava (Emerîka û Awropa), Rûs û Çîn de, di gelek waran de û li gelek cîgehan, berfireh û zor girîng in. Gelo rol û girîngiya Rûs û Çînê her diçe diçilmise an geş dibe? Vêca di vê dema globalîzmê de, pir zor û zehmet e, siyaseta navnetewî bi serkêşiya tek dewletê be. Û ji ber gelek sedeman, guhertina sînorên fermî yên navnetewî li Rojhilata Navîn wê ne hêsan be. Rûs cîranê me ne, Rûs xwedî dîrok, berjewendî û rolekî balkêş û bi hêz e, herweha rola Çînê di warê aborî û bazirganiya navnetewî de her diçe xurttir û berfirehtir dibe, digel hebûna pirsgirêkên wê yên hundirîn. Dixwazim bêjim: Dem di ser xetên reş û sipî re borî ye, siyaseta navnetewî piralî û rengîn e.

- *Wek encam, peyameke we ya ku hûn dixwazin bigihîjin raya giştî ya Bakûrê Kurdistanê heye?*

- Spasiya we dikim û ji raya giştî ya Kurd û Turk re dixwazim bêjim ku pêşeroja Sûriyê ne ji rijîma Bais re ye. Bi hêviya ku ew penaberên Sûrî -çi Kurd û çi Ereb- ên ku koçber bûne û gihane Turkiyê û hinde gund û bajarên Kurdistanê, nêzîk dê vegehin malên xwe. Heta wê hingê, çavên we li wan bin. Û sipas.

**Hevpeyvîn: Azîz Mahmût Ak\***

**Rojname Newroz – hejmar 221 – 28 Eylul**

**Ala Rengîn**

Ala rengîn cara yekê di destpêka sedsala bîstan de diyar bû, patiya " Xoybûnê" li kurdistana Îranê cara yekê bi kar anî. Li meydana Çarçira, li sala 1928an, ev al ji aliyê amojgeha zanistî ya kurdî ve, li Parîsê hate belavkirin. Li sala 1946an, bû aleke fermî ji komara Mihabadê ya Kurdî re li Îranê û yazde heyvan berdewam kir. Lê, ev al li Turkiyê, Sûriyê û Îranê hate qedexekirin . Sê rengên alê hene ( Sor : Nîşana fedekarî û xwîna pakrewanên , ku xwîna xwe bo Azadî û serfiraziyê rêtine ye . Kesk : Nîşana xwerist û xwezaya Kurdistanê kesk û rengîn e. Sipî : Nîşana aşî û asayê ye).



Ew hersê reng bi şêwayekî asoyî hatine rîstandin . Di ortê de , rojek bi rengê zer heye , olên Kurdan ên kevnar nîşan dide . Bîst û yek tîrêjên rojê hene, hejmara (21) jî, nîşana hejmarên pîroz ên ola Zeredestî ne, (ola netewî ya Kurdên kevnar ). Herweha hejmara(21), bîst û yekê Avdarê-yanê cejna Newrozê:(cejna netewî yê Kurdan)- nîşan dide.

**Jêder : Wikîpîdiye**